hejmar 4 zivistan 1989

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Termên rojname û rojnamevaniyê

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*ingilîzî*
helbest, şi'r	şiir	poème	poem
kuncnivîsar, quncnivîsar*1	köşe yazısı	billet, rubrique	column
kuncnivîs, quncnivîs	köşe yazarı	billetiste	columnist
rêzenivîsar	seri yazı, dizi yazı	feuilleton	series
stûn	sütun	colonne	column
rêz	satır	ligne	line
tîprêzî	dizgi	typographie	typography
tîprêz	dizgici, tipograf	typographe	typographer
çap	baskı, basım	impression	printing
çap kirin	basmak	imprimer	to print
çapxane	basımevi	imprimerie	printing house
xwendevan	okuyucu	lecteur	reader
belavkirin	dağıtım	distribution	circulation
belavker	dağıtımcı	distributeur	distributor
weşanxane	yayınevi	maison d'édition	publishing house
weşandin	yayınlamak	éditer, publier	to publish
pritûkfiroş	kitabçı	libraire	bookseller
pirtûkfiroşî	kitabçılık, kitapçı dükkanı	librairie, métier de libraire	bookshop, booksellership
heyber, mijar, babet	konu, mevzu	sujet, matière	subject
têm	tem, tema	thème	theme
naverok	içerik, muhteva	contenu	content
fihrist*2	indeks, fihrist	index	index
berg	kapak	couverture	cover
kiras	şömiz, karton kaplama gömleği	chemise	jacket
nimînende, niwêner*3	temsilci	représentant	representative
nimandin, niwênandin	temsil etmek*4	montrer, représenter	to show, to represent
nimûne	ömek, misal	exemple, échantillon	example, sample
arîkar, alîkar	yardımcı, muavin	assistant	aid, assistant
rûpel raxistin	sayfa düzenlemek	mettre en page	to make up, to lay-out
rûpelraxer	sayfa düzenleyici	metteur en page	page maker, compositor
rûpelraxerî	sayfa düzenleyicilik	métier de metteur en page	compositorships

1. kuncnivîsar, quncnivîsar: ji ber ku li hin deverên Kurdistanê* **kunc *(kuncik) û li hin deverên dinê* **qunc** *tê bi kar anîn û Kurmancên ku* **kunc** *bi kar tînin ji* **qunc** *tê nagihîjin, herwekî yên* **qunc** *bi kar tînin ji ya dinê fêm nakin, me di pêşneyara herdiwan de jî fayde dît.*
2. fihrist, pêrist:* **fihrist *gotineke farisî ya kevin e. Ev gotin di hin ferhengên bi kurdî yên kevin de* **fihrist** *û di hinan de jî* **pêrist** *derbas dibe ku di nav Kurdên rojhelat (Îran) û yên başûr (Iraq) de ya dawî bêtir belavbûyî ye.*
3. nimînende, niwêner:* **nimînende *di nav metnên kurmancî de û di* ***Hawar****ê de gelek hatiye bi kar anîn.* **Niwêner** *di nav kurmanciya xwarê (soranî-mukriyanî) de tê bi kar anîn ku ev* **niwêner** *bi awakî guhartî wekî* **nûner** *derbasî kurmanciya jorê biye û bi vî awayî ji aliyê hin kesan ve tê bi kar anîn.*
4. Kurmancên ku* **nimandin *bi kar tînin, piranî ji bo* **nîşan dan, şanî dan, raberkirin** *û hwd dibêjin. Lê me ew li vir di maneya di dereceya didu an de bi kar aniye.*

Civîna Berlînê

Civîna payîza 1988an li Berlînê di roja 27 teşrîn 1988an de bi vekirina serekê Enstîtuya kurdî ya Parîsê, Kendal Nezan, dest pê kir. Serekê Enstîtuyê ji bo hevalên nûhatî yên vê civînê, behsa bingeh û awayên civînê kir û mazeretên hevalên vexwendî yên ku ji ber hin sedeman nikarîn beşdarî vê civînê bibin, pêşkêşî zanîna hevalên amadebûyî kir.

Di civînê de Khosrow Abdollahî (Selmas), Muzefer Begzade (Şikakan), Mustafa Düzgün (Dersim), Xelîl Dihokî (Dihok), Huseyin Sado (Hesîçe), Reşo Zîlan, Mûsa Kaval (Hekarî), Rojen Barnas (Diyarbekir), S.Rêwing (Sêrt) û Derwêş Ferho (Mêrdîn) beşdar bûn.

Serektiya civînê, her weke berê, bi awayê ku bi dorê rojê yek bike, ji Reşo Zîlan dest pê kir.

Civîn, li gora bernameya xwe, li ser pirsên jêrîn xebitî: termên rojname û rojnamevaniyê, navên cihan, sîstema îdarî ya Îranê, kurmanciya Dîwana Melayê Cizîrî û ya Cigerxwîn û hin xalên gramerê (lêkerên hevedudanî).

Ewê civîna bihara 1989 giraniya xwe bide pirsa termînolojiya hiqûqî. Ji bo amadekirina van peyvên hiqûqî komek ji hiqûqnasên kurd hatiye pêk anîn û ewê di mehên pêşiya me de li ser vê pirsê bixebite.

KURMANCÎ

FERHENGOKA
Dîwana Melayê Cizîrî

Amadekar : Rojen BARNAS

Ev ferhengoka piçûk a ji Dîwana Melayê Cizîrî, perçekî ji rêzexebata berhevkirina gotinên kurdî ji klasîkên kurmanciya jorîn e.

Çerçewa vê xebatê berhevkirin û hilbijartina gotinen kurdî yên di nav nivîsarên klasîkan de mayî ne. Ev gotin ji aliyê hin kesan ve bêne zanîn jî mixabin ji aliyê piraniyê ve nayên zanîn; ew li hin herêman bêne bikaranîn jî li herêmên mayî yên welat hatine jibîrvekirinê. Yaxut hin ji van gotinan di nav axleb Kurdên Tirkîyê de wek gotinên tirkî têne zanîn.

Di berferehkirina zimanekî de riya belkî dijwar, lê ya esasî, berhevkirina gotinên eslî yên wî zimanî: 1) ji afirandinên wî yên klasîk; 2) ji folklora devkî û 3) li sahayê ji devê xelqê ye. Di pey de, ji bo hewcedariyên nû yên ziman, gehîneka "gotin çêkirinê" tê; ku gava meriv bi endaze û bi baldariyeke hûr û xurt hereket neke, dêlva kêr gihandinê wê ziyaneke giran bigihîne ziman, di ziman de bibe sedemê anarşiyeke mezin. Lewra beşa zimannasî ya Enstîtuyê

di civîna xwe ya pêşîn a Barselonayê de vê rêzexebatê wek xebateke bingehîn û berdewam pejirand û da ber xwe.

Ev ferhengoka berpêşî we kirî xeleka diduyan a vê rêzexebatê ye ku herwekî hun pê dizanin xeleka pêşîn ferhengoka Mewlûda Melayê Bateyî bû û ji aliyê mamosta Reşo Zîlan ve hatibû amade kirin. Xebata li ser Şêx Ehmedê Xanî, Cegerxwîn û klasîkên me yên dinê di çerçewa bernameya xebatê di dorê de ne.

Di berhevkirin û hilbijartina gotinên vê ferhengokê de min ji nusxeyên Dîwana Melayê Cizîrî , çapa ji aliyê mamosta Hejar ve amadekirî, esas girt. Lê wê bi çapa Misrê, bi ya Stokholmê (Zeynelabidîn Zinar û M.Emin Narozî pêk anîne) û bi hin xezelên dîsa bi alfaba kurdî-latînî ji wergerandina Qedrî Cemîl Paşa di Hawarê de muqayese kir.

Di xebata li ser maneyên gotinan berhema bingehîn çapa mamosta Hejar e. Di pey de xebata muşterek e ku ji aliyê beşdarên civîna Bruksel û Berlîlê kêmasî hatine rast kirin. Ji aliyê tesbîtkirina hatina orîjîna gotinan ji çavkaniyên jêrîn hatiye istîfade kirin:

1) Ansiklopedîk Lûgat Ferit Devellioğlu
2) Okyanus Ansiklopedik Sözlük, Pars Tuğlacı
3) Persian-English Dictionary, Steingass
4) Ferhengên kurdî û erebî/fransizî/rusî

Di *Dîwana Cizîrî* de ji bilî kurdî, gotinên ku bi selê xwe çînî, erebî, farisî, tirkî, yûnanî û hwd gelek in. Ji ber vî çendî di hilbijartin û tesbîta gotinên kurdî de civîn ihtîmameke gelek mezin nîşan daye şaşiyek piçûk çi ye, neyê kirin.

Di sêwirandina wê ferhengokê de min li gora pîvanên jêrîn gotinan hilbijart : a) Gotinên ku îro ji aliyê piraniyê ve nayên nasîn; b) Gotinên ji aliyê rastnivîsîn (îmla) an bilêvkirinê (telafuz) de têvel in; c) Gotinên ku ji roja Cizîrî heta niha neguhirîne wekî xwe mane.

Li hember maneya her gotinê, ji bo numûne dayinê, me malikek ji *Dîwanê* daniye da ku xwendevan bizanibe ev gotin li ku derê û bi çi awayî derbas dibe. Hin gotin hene ku li hember û di pey maneyê de *bnr.* dinivisîne ku maneya wê «binêre» li gotina di pey de bi tîpên reştirîn nivîsandî. Herwekî : «dav: dafik; *bnr.* li **bend**». Ku dixwazin ka gotina «dav» di kîjan malikê de derbas dibe, divê li gotina «**bend**» binêrin. Li ber wê gotinê malikek ji xezeleke Cizîrî heye ku gotina «**bend**» tê de hatiye bikaranîn.

Ev xebata pêşkêşkirî bi gotina rastî ne ferhengok e, lê ferhengoka ferhengokê ye. Ji bo ferhengokeke temamî divê hemû gotinên bikaranînî tê de hebin. ji bo biservebûna edebiyata klasîkî ev pêwist e, lê îro ne heliz e. Ji ferhengokeke kurdî ya *Dîwana* wî dîsa divê hemî gotinên kurdî yên ku wî bi kar anîne tê de hebin, lê ev jî xebateke ferehtir divê ku niha li dervayê mebesta çerçewa xebata me dimîne. Di çerçewa van herdiwan de ev ferhengoka pêşkêşkirî, ku gotin caîz be, têjika ferhengokê ye. lê hemî gotinên pêwist tê de hene, ji derva nemane.

Hêvîdar im ku bi kêrî têkilpêbiran were

Rojen BARNAS

A

aferîn: bijî
"Rustem û Cemşîd û Xalid, Hemze ya şêrê Elî
Aferîn ya **şehsiwarê** turk û rimbazê ereb"

al'al: helale, lale
"**Sunbul** bi sema tên û gulan perde dirandin
Bişkiftine **al'al** û hişîn bûne terazin"

amanc: armanc
"Bendeyê sadiq seher **amancî** reştozê xwe kir
Min bi qewlê dijminan det ber xedengan bê sebeb"

awaz: deng, sewt
"Ney dûr e hebîbê me çi feryad û fixan kin
Wê guh li zemîra dil e **awaz** çi hacet?"

ax: erd, xwelî
"Ji **axa** asîtanê **mistekî** bîn
Li daxan da bibînim xweş seba tîz"

azar: êş, eziyet, sancî
"Ahî ji derdê dil dikit herçî ku dî **azarî** çerx
Derbê li nîva dil didit lami' sifet nûbarî çerx"

B

bac: wêrgî
"**Cuhtê** Hebeşan bi turfet-ul- 'eyn
Anî qederek ji Espehan **bac**"

bal: nik, cem
"Li **bal** 'îlmê te me'lûm e ji jînê min tu meqsûd î
Fîdayê canê me dê can bit di qesda wesl û **dînê** da"

balîn: balîv, balgeh
"Da nale û ahên me ji dil seh bikirî
Wer guh bide **hindavî** serê **balînê**"

ba Xoy: bi Xwedê
"Bendeyê **ba Xoy** bivêt dê meylî sîm û zer **nekit**
Da 'etaya padişahan bê hed û ejmar bit"

bazîn: leyistin, baz dan, revîn
"**Çerx** e felek û melek **dibazin**
Şemsun we kewakibun we ebrac"
"Li ber çogan û kaşûyan ji derba Turk û Hîndûyan
Dibazim herwekî goyan dema ew têne meydanê"

behîtin: helandin
"Cewra te behîtîn û cefaya te perîtin
Qurbanî te bim guh bide carek gilehê min"

bejn-aferî: bejna ku bi naz dimeşe
"Da xef nebit bejn-aferî mey hate şehkasa surî
Mînnet ku îro dîm-durî dîsa şeraba nab da"

belazîz: gezîze, sunbula daristanê, ya kûvî
"Ku lê têt ew qebaya asimanî
Letîfa şeng û nazik wek belazîz"

belg: pel; *bnr.* li perr

benda heyderî: xişrê li ser kofiyê
"Kewkeb û qewsê qezeh lu'luê benda heyderî
Tên tewafa zulf û xalên dilrubayê rast û çep"

bend: girtî, dîl, girêdayî
"Dil bendê dava zulfekê keftî kemenda ulfekê
Hel fî yed-îl meftûnî şey ew key fe esne' ya feta"

ber ve: ber bi
"Ber ve şerqê di seher westayin
Hîndûyên rojperest in çep û rast"

ber: kevir, seng
"Çi eser dê li berî xare bikit qetreyî ab
Qelemê me bi dosê qetreyê zuha dê çi kit"

berî: sade û hêsa
"Girişme û raza berî 'arif venabin lê derî
Hetta di nêva agirî ew xef nebit perwane reqs"

berx: birca karikê, birca berxê
"Heyheya reqs û semaya te çi xweş bestiye çerx
Ku di burcê bi sema têt li ser destê xwe berx"

bestîn: girêdan, rapêçan; *bnr.* li berx

bexşîn: 'efûkirin, dayin
"Yek bûse bexşî ewwel bi îhsan
Axir li min kir curm û xeramet"

bext: îqbal, talih
"Zuhre û 'îqda sureyya keşşifî bûn ew di şerq
Sayeya bextê me dayê ma li ser perde û nîqab"

beyhûde: bêhûde
"Kes bi dada me nepirsit gileh û dad çi kit
Te nebit dadresek beyhûde feryad çi kit"

bêgav: tim, bêwext
"Aşiqan bêgav lew kalîn ji dil tên şubhê re'd
Wan ji bala lê dibarin wek brûskan remz û naz"

bêt û ret: were û here
"Her mecala ew di cengê bêt û ret her carekê
Rast û çep de bêxitin, sed bi mizraq û qeseb"

bêvîr: nexweşê li ber mirinê, ji hêz ketî

"Herçî bêvîrê ku navê dilberê bêtin li ser
Xweş dibit hadir di gavê bê guman û şubhe ye"
biçîn ver: li berê biçîne (deyne)
"Enqa ne şikara kes e davan tu biçîn ver
Dava ku enqa tu vedî badî hewa girt"
binoşîn: em vexwin
"Heyata dil meya baqî binoşîn da bi muştaqî
Ela ya ey-yuhes-saqî edir kes'en we nawil ha"
biretin: herin, biçin; *bnr.* li bêt û ret
biste: bê tirs, bê şerm, bê teklîf
"Were xanim bikuj biste bi xencer
Melê, emma bi destê xwe-y mubarek"
bişko: bişkok
"Çîng-çînga bişkoan awaz û dengê zergoan
Sed melayik guh didin ber wê newayê rast û çep"
bişkoj: xonçegul, xonçe
"Sehergeh endelîb mest in ji bihna werd û bişkojan
Şubeh tûtak û goyînan dinalîn em di firqê da"
biwar: bihart
"Weh ku bê şahid û mehbûb te umrê xwe biwar
Karekî rabe bike weqt e ku êvar e dereng"
biwerîn: werîne, bîne
"Veke lêvê û ji nîvê biwerîn qend û nebat
"Ji lebê le'lê şekerbêj û ji şeker meke behs"
bînahî: ronahiya çav, qudreta dîtinê
"Şukur bînahiya min hat û Ye'qûb dîde rewşen bû
Bi bûya Yûsifê Misrî li Ken'anê beser peyda"
bîz: kerahet, xweparêzî, xwe jê girtin
"Xebais-teb' e, j'ehil seg-sirişt e
Yeqîn ew ker ji canan lew dikit bîz"
bîzî kirin: hez nekirin, xwe jê girtin
"Bîzî dikit ji qencan ji remz û naz û xencan
Qedrê gulan çi zanit ? Kerbeş divêt kerê reş"
buxçe: baxçê gulan
"Me ji buxçe ya yar zeyyinî bê pirs yek sêvek çinî
Web'ma ceney tû centeyî elqet'eley ye cînyeta"
butperestî: pûtperestî
"Etwarê 'işq û mestî, esrarê butperestî
Teqîrê sed rîwaret nakit ji bo kîfayet"

C

cerg: ceger
"Mehbûb û reyhan pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cullab da"
cuht: cot, *bnr.* li bac

Ç

çelek: xwarbûna wekî serê çoganê
"Êsîr kirim zulfa çelek ew horiya şubhet melek
Tîr dan ji reştozên helek mecrûhê qewsê purweşîn"
çenber: xelek, daîre, muhasere
"Xef da me cama kewserê şirîn-qed û leb şekkerê
Bayê seba da çenberê hatin sema şetrî û lef"
çendan: ewçend
"Zehrî derdê mezin firqet ciger sot ateşî da dil
Cihê sebrê nema çendan ferec min dî di sebrê da"
çengal: çengel
"Sur şîrînê, nazenînê, kuştime nakit yeqînê
Wê bi çengala evînê dil ji min bir dil ji min"
çeper: mewzî, sîper
"Tîr sed têne ciger sîne li ber maye çeper
Ji dil û cergê kul û sîneyê ker-ker meke behs"
çerx: daîre, xelek, felek
"Hin zerî ne pur sur in, serbiperr in dêm-dur in
Min ku di çerxê we dî sebr û qerar im nema"
çevandin: tewandina wek çenberê
"Ez dibêjim dê li min dîsa ceger sed pare kin
Wê bi mîzan herdû şîrazî çevandin mahî new"
çîn: xelek, badok, kurîşk
"Çin çîn kirin zulfên siya kesk etlesê diba qeba
Îdî nîşan nabin xuya têkel kirin lazim seba"
çogan: golf; *bnr.* li bazîn
çokar: xizmetkar
"Her serê dewlet hebit dê her di nêv benda te bit
Herkesê 'aqil bitin dê her di çokarê te bî"

D

dabiristin: rêz bi rêz bûn, sef girêdan
"Zengiyan cewşen vebestin pêşberî coqa Hebeş
Dabiristin yek bi yek çûn ber lîwayê rast û çep"
dad: hawar, edalet, medet; *bnr.* li beyhûde
dane: tene, tane
"Canê xwe meke daneyê dava ku vedayî
Ahû-sîfet ew pê hesya rahî xeta girt"
dav: dafik; *bnr.* li bend
der dest: di dest de
"Ji du'ayê qedehek der dest e
Her seher mestî meyî-nabî du'a"
derbend: bender, lîman
"Xasî teşrifa te bin derya û derbendê ecem
Da xelatên her seher sed zerkeş û mexmûr bê"
destgîr: hamî, alîkar
"Destgîrê te nebit Xidrî 'înayet li qedîm
Nagehî abî heyatê bi du esker Elyas"
destûr: îzin, îcaze
"Ji ser dîmê nîqab avêt û destûra tewafê da
Bi se'yê beyt û îhramê û min eswed ziyaret kir"
derîn: dayin
"Qehweya telx digel zehrî helahîl biderî
Me ji destê te mibarek şeker-amîz e xweşab"
di gavê de: di cih de, tafilê
"Xedenga firqetê re'd e dilê ew xefletê lê dit
Dibêjim wer cebel bit ew bi ker bit wê di gavê da"
digel: pê re, *bnr.* li derîn
dihnêrim: ji hinartinê; dişînim
"Her seher dihnêrim ez cana bi ahan ra ji dil
Barek-el Bari bi îs'adîn 'eleyha yewma 'îd"
dijwar: zor, zehmet
"Sar dibit dil ma bi sed cewr û cefayan zerreyek
'îşq teb'et-nar e hingî dê biçît dijwar bit"
dilgeşte: dilmayî
"Dilgeşte me ji dêrê naçim kinîşteyê qet
Mîhrabê wê bi min ra wer da biçîne Laleş"
dîdar: yê dîtî, rû, dîtin
"Kuştiyên dîdar û dînê bê xeta her dehsed in
Her seher dîsa ji nû va têne kêrê sed celeb"
dîl: esîr
"Dîl me hezar in te di bendê we lê
Leyse lena 'enke mecalu bedîl"
dîm: dêm, *bnr.* li bejn-aferî
dîn: temaşe, dîtin, *bnr.* li bal
dojeh: cehenem
"Ger ji wê horî siriştê 'işweyek îzhar bit
Dê bibit narî Xelîl-ul-lah û dojeh sar bit"
dos: dews; *bnr.* li ber

E

eger: heke
"Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê
Bibêjit secde bin latê murîdên wî dibin qatî"
Ehremen: xwedayê tarî û xerabiyê yê zerduştiyê
"Ehremen te'lîmê dabû Ebyedî dest tê hebû
Pur bi vê te'lîm û rayê hatibû çûbû xîtab"

ejmar: hejmar
"Lê şehîdên te bi ejmar bi xencer kuştî
Hê neçû xûn ji birînan sed û heftad û du leş"

endaze: qiyas, pîvan, usûl
"Remzên te di canan ne bi endaze di raz in
Heryek bi hezar reng rewanê me dixwazin"

er: eger
"Ji Hafiz qutbe Şîrazî Mela fehm er bikî razî
Bi awazê ney û sazê bibin ber çerxê perwazî"

Erjenk: pirtûka wêne ya Manî pêxemberê îranî
"Bi sîmavê bi zêravê tu rojê neqşekî bavê
Ku da Erjenk ji wê navê li ber rojê nebit perde"

erzen: erzêng, çene
"Katibê neqşê qudretê zêrî reşandî ser xetê
Erzen û dîm û cubhete pê neqqişand û kir nuqet"

eşkere: aşkera, aşîkar
"Belko dîwar bi guh bin bi Xwedê kî bi Xwedê
Bi tu rengî nekirî eşkere esrarî hudûs"

ev reng: bi vî awayî
"Hat der ji burc û penceran dil girt û da ber xenceran
Ev reng e halê dilberan lew 'aşiqan xûn bûn ceger"

evistin: evîn
"Agir di ab û gil diket qelban ji qelban hil diket
Metqeb di can û dil diket daîm evistin karî çerx"

F

find: mûm
"Fîraqa dilbera rind e behîtim ez wekî find e
Musilmanik di rê min de xeber bit balî sultanê"

fira: yê pirr an zû difire
"Me û nesîm xweş pence têkra wê diçîn wek teyr vêkra
Behsê zulfa yar pêkra bûrî 'işqê pur fira ye"

firişte: melek
"Hûr û firişte kê weh dîn nazik û xob û sur şîrîn
Dîmê nimûne ber bikîn sûretê çîn numa xelet"

fûr bûn: fûrîn, kelîn, bilqîn
"Her derê ne'lê feres şubhet boraqê vêkevit
Çeşmeyê heywan ji ew erdê mubarek fûr bî"

G

gaz: kelbetan
"Serwî-nazê serfîrazê şubhê zêr remz mecazê
Dame ber çakûç û gazê dil ji min bir dil ji min"

gazinde: gazin, gazinc
"Şakîssîlahî her dem bi kuştina Melê bit
Gazindeyan ji kê kim, ji kê bikim şikayet"

gerçî: herçend
"Şerhê halê min Mela narit beyadê hê temam
Vê sewadê gerçî her dem jê birin sed întîxab"

gerd: xwelî, toz
"Suhtim ez pêta evînê têk biwam gerd û heba
Inne lî ayatî sidqîn kane fî haz-en-neba"

gerden: cihê sîng û stû digihîjin hev
"Wê şepalê misk-xalê dîmdurê gerden-şemalê
Cebheta biskan sema lê dil ji min bir dil ji min"

gestin: gez kirin
"Gestîme xelq û 'eqrebê mest im ji şewqa xebxebê
Tali' tinê me d'kewkebê îro 'eqarib têne der"

geşt: gerr, seyran
"Buxçeya sorgul di geş tê çîçek û reyhanê reş tê
Dilrubayan têne geştê sunbulan ta ta sema ye"

gêra: guhart, guhirî
"Feyza 'ulûmê hikmet cama sedef ku gêra
Me j'destê muxbeçan dît bi mishef û bi ayet"

gil: herî
"Her gil û seng dibitin zêr bi tedbîrê hekîm
Qabiliyet ku nebit hikmetê ustad çi kit"

gileh: gilî, şikayet; *bnr.* li behîtin

girtî: hebsî
"Dilberê serdarê xûban ez nizam agah heye
D'hebs û zîndanê esîr girtiyê dermande ye"

go : gog; *bnr.* li bazîn

goş: guh
"Goşî bi 'amê me de terkî mudamî me de
Ekserûhum fi xuma exlebûhum fî 'ema"

goyger: gobaz, yê xweş bi gogê dileyize
"Textê di mîr û begleran meydanê coqa goygeran
Eslan û cotê meyxuran mey dan şeraba saxerê"

goyîn: cureke balinde ji malbata pepûkê; *bnr.* li bişkoj

gulav: ava gulan; *bnr.* li cerg

gunbed: qube
"Wê bi sed pencereyan daye şu'aya qidemî
Gunbedî işqê li ser kursiyê dewwarî hudûs"

H

heçî: herçî
"Heçî firqet nedî hîcran nebê min dax û key lê ne
Ji bil derbê di hîcranê fîraqa rûh û can kê da"

heç wekî: herwekî
"Secdeya ber eswedan nadim bi sed hec-ekberan
Sond bi wan zulfan û xalan heç wekî bêjim we ye"

hela: hê, hêja, hele
"Pur min ji vê çerxê Mela kêşane afat û bela
Ebleh bibînim wî hela herçî ji dil bit yarî çerx"

hema: tafilê
"Teşbîhê bi cedwel me di nêv ateşî işqê
Dil qelbê heqîqet bit û iksîrê hema girt"

hempa: emsal
"Li min pirsek bi dildarî dibit hempayê dîdarê
Vewestayim di ferwarê li 'ebdê xwe ke fermanê"

henarîn: şandin, hinartin
"Qasid bi meqsûda me hat ba mujde û emr û berat
Nîşan hinarîn hem xelat şehzadeya gulgûn qeba"

heriftin: roxandin
"Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sihlê û seylê
Muhbet û 'işqa di Leylê ez kirim yekser pilox"

hevdeng: emsal
"Zerîfê nazikê şengê sifethorê perîrengê
Bi rojê ra tu hevdengê du reştozên siyehrengê"

hevotin: fêr kirin
"Hostayê 'işqê dil hevot ser ta qedem hingî disot
Remza en-el-Heq her digot bawer bikin Mensûr e dil"

hey û hey: timî û daîm, hê jî
"Qedehek taze ji 'işqê di ezel da me hekîmê
Jê dinoşin hey û hey hê bi xwe cama me lebaleb"

hilê: (roj) hilê
"'îd e û hebîbê nezr e lê yan dê bi qurban bî Melê
Ya Reb bibînim roj hilê sikkîn di dest qessabê da"

hindav: raser; *bnr.* li balîn

hingaftin: lêdan, îsabet kirin
"Kûsê ku hingaft bi şahî li text

Padişehan neqdî rewan dan xerac"
hingî: ewçend; *bnr.* li hevotin
hir: hire, vira, vê, vêder
"Er ne hudhud ji Seba bêt û wekî bayê Seba
Dê ji hir ku bigehit dest ve peykê heremê"
hol: topa ji kulav an ji potik çêkirî; binêre li gogê
"Mîr û Kurmanc li holan qederekî westane
Lê di nîvê bi sef û tîpê ereb hatine ceng"
hosta: osta; *bnr.* li hevotin

J

jehrî: bi jarî
"Zulfên bi tew şîrîn leban jehrî ne şubhet 'eqreban
Lê min ji biska pur girî îro tinê girtin du ta"
jeng: zeng
"Newaya mutrib û çengê fîxan avête xerçengê
Were saqî heta kengê neşoyin dil ji vê jengê"
ji rengê: mîna, wekî, bi mislê
"Me ra j'ewwel çi bir xamê kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'dî û Camî ji şuhret pê hisîn 'amî"
jih: têla sazê muzîkê, rûdiyê zirav
"Ger şubhetê perwane di bezmê te çi sed ger
Sed nale hezar rengî wekî çeng û jihê min"
jiha: ejdeha
"Zinhar e kesê dest bibit erqemê serwê
Bê 'işweyê le'lan ne bi teslîm jiha girt"
jî: umr, temen
"Muhbet û mihnet di zor in hub dibêm bê şek bela ye
'Umr û jî xweş pê diborin sotin û derd û cefa ye"

K

kalîn: nalîn; *bnr.* li bêgav
kan: xezîne, ciyê maden û xwê jê derxistinê
"Kan bi gewher çi bikit gewher eger pak nebit
Tu besîret te nebit sîretê ecdad çi kit"
karsaz: jêhatî, yê ku kar pêk tîne
"Sed baziyan ev huqqebaz tînit bi hîle karsaz
Geh geh ku naz e û geh niyaz sehhar û pur mekkarî çerx"
kas: piyan, kase
"Herçî rengê te bivêtin xwe bibinî lîllahî
Nezerê wer bide kasê çi xweş ayîne ye kas"
kaşû: kaşo, darê serkaşo yê çoganê; *bnr.* li bazîn
kemend: tayê serî bi hilboq; *bnr.* li bend
ker kirin: perçe kirin; *bnr.* li ceng
keyber: kêra mezin, birîn
"Min di dil kovan hezar in dax û keyber bê hisab
Mihneta werdên bi xar in wên di dil da sed nîşab"
kezeb: cegera reş, mêlag
"Xefletê ew keşşifî şîr dest bi dest hatin ceger
Go xebînet ya Mela miskîn Melê ker kir kezeb"
kêmxew: qumaşê qedîfe ku xew (pûrt)ên wî kêm in
"Nazik letîf gerden zerîf lebsê şerîf kêmxew qedîf
Min dî bi wext ew nîk-bext îro li text fexfûrî bû"
kilox: qafê serî
"Dest nehêlim ez ji dînê şubhê Ferhad û Şîrînê
Wer ji ber 'işq û evînê min di rê çit ev kilox"
kok: xweşik, bi edeb, mukemel
"Tu bimeş kok bi ser derê qesrê
Bi xwe kokî li şah û qeyser ke"
kovan: derd û hesret; *bnr.* li keyber
kûre: hêtûn
"Fa'ilek lazim e da fi'l û eser peyda bit
Ger tu heddad nebit kûreyê heddad çi kit"
kûze: cêrê avê
"Tu şerabê bi xerabê bi nehingan deh demî
Dê kifayet bi çi rengî me bikin kûze û tas"

L

lê miştin: tê gevizandin
"Bi derbên xenceran kuştin bi xwîna sohrî lê miştin
Di çîna sunbulên qişt in me dil pur misk û mawer de"

M

meger: wisa ku, halbûkî
"Meger şîrîn bi wê şîraniyê bû
Ela şems-ul melahet qed tuşarek"
meyfiroş: şerabfiroş, meyxanecî
"Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tên sema
Badexwiran noş noş mane li dorê cema"
misrî: şûrê destkariya Misrê
"Xencer û tîr û teber barîn şibih berq û brûsk
Misriyan lamî' ji elmasan didayê rast û çep"
mist: kulmekê, kulmek bi dev re; *bnr.* li ax

N

naçar: bêçare
"Hey'eta keyf û kemê bê keyf e keyfa arif e
Dê bimînit ger nebit naçar bê tiryak rûh"
napak: neqenc
"Cami 'işqê paki rûhani tuhûra batin e
Ê nenoşî her we ma hetta ebed napak rûh"
neşêm: nikarim
"Mey ber kefê meşha sefê soza defê da qerqefê
Husna li dêm wesfan neşêm herçî dibêm jê dûrî bû"
neynik: eynik
"Gerçî her daîm ji mihrê neynika dil bedr e min
Wek hîlala subhe têm ez carinan bim napedîd"
nihe: niho, niha
"Te divê dawî birî bit nihe da
Bibirim ser bi du enguşt meqes in"
nima: nîşan dan, temsîl kirin; *bnr.* li vê ra
noş bit: afiyet bit
"Herkesê camê ji destê wê binoşit noşî bit
Ê ji wî destî nenoşî zehrî bit lê ew medam"
noşîn: vexwarin; *bnr.* li napak
nuhtin: îsabet kirin, hingaftin; *bnr.* li suhtin
nûbar: berê nû teze, cureke kevanê bû ku pê çend tîr bi hev re dihatin avêtinê.
"Gezmeyek qewsê şevîn aşiq bi nêva dil kevit
Dê ji can destan bişot xasma kevan nûbar bit"

P

payan: dawî
"Husn û cemalê canan nadêritin tu payan
Herçî nebit bidayet esla nehin nihayet"
pehnî: pehnayî, rastayî
"Pehniya wê çerx û dolaba dinê
Nisbeta erbabê 'irfanê xelet"
pencere: pace, şibak
"Wê bi sed pencereyan daye şu'aya qidemî
Gunbedî işqê li ser kursiyê dewwarê hudûs"
pergar: pergela xêzkirina çenberê
"Kes dî li lewhê sîne qet neqşek ve hatî bê xelet
Herdem ji nû yek taze xet tavête der pergar xet"
perhîz: xwe parastina ji hin xwarin û vexwarinan
"Şem'ê ser nûr nadirit ger ew nekit perhîz dil
Zewqê cama işqê nakit ger nekit îmsak rûh"

perr: polik û pereyên xişirê xemilandinê
"Şetrî û zulf û belg û perr hemyan li dêm de'we û şer
îlan li sewa bûne ger 'eqreb xuyan ez her teref"
perwane: perperoka li dora çirayê digere, aşiq; *bnr.* li berî
pertew: ronî, purtew
"Heyf di qeyda xak û gil bit arifê çalak rûh
Dê mucerred bit ku pertew dit ji nûra pak rûh"
peyda: hasil; *bnr.* li bînahî
pêt: alav
"Brûska batinî da dil di pêtî sîne wê wer bû
Ku dê bêtin tebîta dil di nav wê nar û pêtê da"
pilox: bizotê agir
"Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sîhlê û seylê
Muhbet û 'işqa di Leylê ez kirim yekser pilox"
pîrê muxan: pîrê meyxanê, serekmelayê zerduştî
"Xizmeta pîrê muxan dê kit kesê meqsûd e mey
"Şîşe û cama zucacî yê divêt dê ret Heleb"
poşîn: pûşî giredan, xêlî kirin
"Ji wê camê dinoşim ez
Seher lew ney li hoş im ez
Ji 'amê lê dipoşim ez
Bi can her lê dikoşim ez"
pur sur: cazib, dilkêş
"Hin zerî ne pur sur in ser bi perr in dêm dur in
Min ku di çerxê we dî sebr û qerarim nema"
pur: pirr, gelek; *bnr.* li cerg

Q

qe: hîç
"Ji lebê le'lê şeker yar qe nekir pursa Melê
Misriyan gezme reşandin ku kişandine elmas"
qeyser: împarator, kayzer, çar; *bnr.* li kok

R

rimbaz: leşkerê bi rim şer dike, hostayê rim bikaranînê; *bnr.* li aferîn
rîşî: gulik
"Netrik û tayên bi rîşî ê di zêr in pê ve wîşî
Min du fêris dîn di pêşî mirwet û insaf yox"
ruswa: rezîl, bê îtîbar
"Ruswayê 'işqê tenha ne ez bûm
Kes dî zemanan hub bê melamet"

S

saye: hîmaye, alîkarî, siyanet, sî; *bnr.* li bext
seng: ber, kevir; *bnr.* li gil
serbiperr: ya ku tûncik û temorîk bi perrikê zêr in; *bnr.* li pur sur
sermal: pêçeya li serî tê pêçanê.
"Sosinên taze û muşkên walan
Bes perîşan ke li ser sermalan"
serw: selwî; *bnr.* li jiha
seywan: sîwan
"Erzê halê min bigota yê bi 'inwanê edeb
"Asîtan bikra ziyaret çetr û seywan û tunab"
sêgah: cureke meqamê muzîkê ye ku zuhdeke xurt û hizneke aşkere distirê.
"Lîllah were saqî bi du caman me ciwan ke
Mutrib bi defê ra bide sêgah û şebabê"
sîne: sîng, dil
"Rast û çep têne ceger sîne kulab
'Er'erên şengî dilestin çep û rast"
suhtin: sotin, şewitandin
"Bi narê firqetê suhtim ji ferqê ser heta pê da
Xedenga xefletê nuhtim ji berqa lamî'a tê da"
sunbul: simil; *bnr.* li geşt
suxte: feqeh, şagirt
"Go suxte murada xwe ji min telbe ke îro
"Min go ji kerîm telbe û daxwazî çi hacet"

Ş

şahbaz: bazê spî
"Ew dilê min wek kebûter nabitin kes lewme ket
Lew di vê torê we da keftî me dîn sed şahbaz"
şahîn: şahbaz
"Teyrê dil bê tem'ekî nayête dest şehzadeyan
Qûşçiyê şahîn di destê dê dibê azar bit"
şahnuşîn: şaneşîn, balkon
"Şahnuşînên nazikan zayi' mekin
Da nebînî dil bi xanê xelet"
şehsiwar: şahê siwaran; *bnr.* li aferîn
şek: lêdana bi çoganê
"Mislê goy bê ser û pa bûme li ber derb û şekan
Lew bi çoganê cefa ya xwe ji dil hûrî kirin"
şeng: bi kêf, bi şipil; *bnr.* li belazîz
şepal: bejna lihevhatî û xwînşîrîn, ferxê şêr
"Xwîn ji dil co co rewan tê wek 'eqîq û erxewan tê
Lê ji dest selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox"
şetrenc: setrenc
"Di meydanê şîrîn xencan bi çerxên mislê şetrencan
Turaba ber piyê qencan zubad û 'enberên gerd e"
şîret: nesîhet
"Xelqno li min kin şîretê ew dilbera zêrîn kemer
Min dî di halê xefletê hat der ji burcê wek qemer"
şîşe: şûşe; *bnr.* li pîrê muxan

T

tar: çenbera pehn a ji dep an metal; tara deholê
"Tu ji ber perdeya wehmê were der da bibihî
Çi newa tête bi sed nexme ji ew tarê hudûs"
teba: tev de
"Sebr û qerarim ku bir can û ceger hûr dikir
Zulmê we reng kî dikir can dibir û dil teba"
tenha: tenê, xalî; *bnr.* li ruswa
tepandin; bi serî de anîn, tûşî kirin; *bnr.* li wer ne
terazin: mêrg û çayira li keviya; *bnr.* li al'al
tewizandin: givaştin, xemilandin
"Nesrîn û binefşe tewizandin
Mawerd direşand şûşeî 'ac"
teyîn: tewîn
"Tiliyên nazik şemalîn min li ser çehvên xwe malîn
Talibê werdên bi xal în dil di vê fikrê teya ye"
tê werbûn: çeng kirin, êrîş kirin
"Cin û teyyarek me dî wer bû di min winda kirim
Dame ber pence w kulaban hilfirandim wek 'uqab"
têkel kirin: tevlihev kirin
"Wajîgûn dewrê numa min çerx û bayê lewleban
Kewkeban seyra muxalif girt û têkel kir hîsab"
tinê: tenê; *bnr.* li jehrî
tîp: deste leşker, deste siwar; *bnr.* li hol
tu: hîç; *bnr.* li kan
tundî: tîjî, tûjî (gurr)
"Da me şehzade bi destê xwe mubarek qedehek
Ne xubarek ji xumarî û ne tundî û ne xeş"
tûle: cewrik, dêlik
"Ku tûlê asitanî dûr nekî êdî ji dergahê
Ji ba Xwo vî rucû nakîn di babê lutt û rehmê da"
tûtak: tûtî, dûdû
"Sehergeh 'endelîb mest in ji bihna werd û bişkojan
Şubeh tûtak û goyinan dinalîn em di firqê da"

U

umid: hêvî

"Bi umîda te humayê ne Melê tûr veda
Wer temaşayê cihan bûye hemî tûr û şebek"

V

vajî: ters
"Munqelib min dî menazil vajî ew seyrê dikin
Yek bi yek xwîn jê dibarin ateş û lem' û şîhab"
ve: ecêb, veh
"Ve Melê sur periya hûrî sifet
Sed melek destî be dest in çep û rast"
vebestin: xwe rapêçan
"Zengiyan cewşen vebestin pêşberî coqa Hebeş
Daberistin yek bi yek çûn ber lîwayê rast û çep"
vejîn: ji nû ve jîn
"Ji remza dilberê dîsa li min hatin vejîn derd e
Di lebsê tariyê min dî xwiya bû ew siyah-çerde"
vemal: bimale
"Zulf çûne ser nûra zelal carek were bayê şîmal
Biskan ji ser dêmê vemal zulfan ji ber cotê esed"
vewestan: sekinîn, rawestan; *bnr.* li hempa
vexwendin: dawet kirin
"Bi tûlên asitanî ra vexwendim mîr bi dergahê
Bi vî çavî hebîb dîtim şukur ev şefqê Mewlê da"
vêk ra: pê re
"Zuhre rengê mal û xurşidê ji bala wê nima
Lew du kewkeb çûne vê ra îstiwayê rast û çep"
vêk ketin: yekdîger bûn, bûne yek
"Vêk ketin şems û zuhel îro di burca 'eqrebê
Seyf çû destê merîxê mulkê dil lew bû xerab"
vêkra: bi hev re, bi hevûdu re
"Bi werdan zeyyinîn gulşen çîmen da lale bişkiftin
Binefş û çîçekan vêkra şefeq da yek di rewdê da"
vi : bi
"Şox û şepala meyperest ew zalima hişyar û mest
Vê nameyê xef dî vi dest fî teyyiha neşrun-neba"

vîn: îrade
"Husn û cemalê xwest evîn vêkra di yek zatî civîn
Nûra qedîm bû 'işq û vîn wan li êk naz û 'işwe da"

W

wajîgûn: berevajî, bê oxir; *bnr.* li têkil kirin
we: weha; *bnr.* li pur sur
weh ku: wisa ku; *bnr.* li biwar
werhatin: gevizîn
"Bi dama muhbetê bend im xedenga fîrqetê dil nuht
Bi şubhê murxê nîm-besmel di hev wer têm di xwînê da"
wer ne: heke na
"Setweta Leylê yeqîn Mecnûn tepand
Wer ne Qeys nakit beyabanê xelet"
westan: muhlet dan, navbir, man, rawestan
"Ber vi şerqê di seherê westayin
Hindûyên rojperest in çep û rast"
wêran: kambax
"'Alemek wêranî zulfên te ji rengê 'enberê
Çerx û perwazê didin carek li bayê rast û çep"
wîşî: gûşî; *bnr.* li rîşî

X

xak: erd, ax
"Da di çeşman min werîna xakê her wek tûtiya
Ya hebîb pê lê nihayî baniya wê ew turab"
xal: nuqte, deq
"Bi xalên werd û nesrînan ji Qudret xet kişandî lê
Bi terha nêrgiza 'êlî sehergahan nesîm lê da"
xasma: nemaze; *bnr.* li nûbar
xemrevîn: ya xemên meriv direvîne, yar
"Xema 'işqê perihtim ez hebîba xemrevîn kanê
Seraser têk behîtim ez ji derdê firq û hîcranê"
xêlî: pûşîya ser rû
"Li ber rojê bibit xêlî binêrim qameta 'êlî
Qedîf û zerkeş û têlî zebad û mîsk û 'enber da"
xunav: aviya li ser gul û giya
"Li gulên tey' terr û nazik ku seher girtî xunav
Di ebarîq û qinînan ji hesed suhtî gulab"
xwe spartin: tewekul, îtimad
"Kor e xwe nasipêrit carek bi dest delîlan
Ebleh çi kit tewafê nabînitin berê reş"

Y

yeksan: beranber, wekhev
"Ê bi Xidrî ra divêt ava heyatê bit nesîb
Dê bi se'y û cehdê yeksan bin li bal wî roz û şeb"
yekta: bê emsal, li ser tayekî
"Nisbet perî zîba ye ew wek nêrgiza yekta ye ew
Ya men rea xillî fe hel yuşbî bî şey'în qameta"

Z

zehr: zar, uslûba peyivînê
"Bi zehrê xwe î şerîf xwendim ku xizmetkarî dêrînî
Te pur cewr û cefa dîne silûk û se'y û cehdê da"
zend: milê jêrîn, ji enîşkê heta qevdika dest
"Wan dest û zend û sa'idan mey dane şeyx û zahidan
Mestî bi çeşmê şahidan ew nêrgiza seyrab da"
zengar: kesk, sewz
"Herfên ji qudret nuqte pur madarê hewza le'l û dur
Ev rengî kê dî weh bi sur qudret-nimûn zengar xet"
zengî: zencî; *bnr.* li vebestin
zerbaf: qumaş an perçeyên ji hevdayên zêr têkel
"Zulfa siyah 'enber bike xemlê ji zêrê zer bike
Zerbaf û dîba ber bike misk û gulavê lê reşîn"
zerbav: kanarya
"Reyhan û sunbul tê hene sed çîçek û gul tê hene
Zerbav û bulbul tê hene ew baxçeya gulzar xet"
zergo: guharê zêrin; *bnr.* li bişko
zerkeş: li ava zêr xistî
"Wer guh de çeng û nayê şîrîn ku bên semayê
Camê binoşe vê ra çi sade û çi zerkeş"
zêrav: ava zêr
"Bi sîmavê bi zêravê tu rojê neqşekî bavê
Ku da Erjeng ji wê navê li ber rojê nebit perde"
zînhar: eman ha!; *bnr.* li jiha
zîwer: xişir, tiştên xemlê yên ji zêr
"Zêr û zîwer dikirim celbê qulûban haşa
Husn û sur zatî nebit qametî meyyad çi kit"
zox: zoxav, kêm
"Ah û oxên min ji dil tên lê ji ber tîra qizil tên
Yan ji kovanên di kul tên jê dizêt her xwîn û zox"

(dumahîka *Termên rojname û rojnamevaniyê*)

raxistina rûpelan	sayfa düzenleme	mise en page	make-up, making-up, lay -out
montaj	montaj	montage	setting
sekreter	sekreter	secrétaire	secretary
beşdar	katılan	participant	participant
beşdarî	katılım	participation	participation
tevkar	katkıda bulunan	contribuant	contributor
tevkarî	katkı, katkıda bulunma	contribution	contribution
hevkar	işbirlikçi, iş arkadaşı	collaborateur	collaborator
hevkarî	işbirliği	collaboration	collaboration
xwudan, xwedî	sahib	propriétaire	proprietor, owner
Xwedê, Xuda	Tanrı, Allah	Dieu	God
wergerandin	tercüme etmek tercüme	traduire	to translate
werger/wergerandin	tercüme	traduction, action de traduire	translation
wergêr	mütercim, çevirmen	traducteur	translator
wergerandî	çeviri, çevrili	traduit	translated
wergêrî	çevirmenlik mütercimlik	métier de traducteur	translatorship
tercuman, paçvan	tercüman	interprète	interpreter
paçve, tercume	tercüme (tercümanlık)	interprétation	translation
tercumanî, paçvezanî	tercümanlık	interprétariat	interpreting
arşîv	arşiv	archive	archive
rast kirin	düzeltmek, tashih etmek	corriger	to correct, to read (proof)
rastkirin	düzeltme, tashih	correction	proof-reading
rastker	düzeltici, tashihci	correcteur	proof-reader

JI PIRSÊN GRAMERA KURDÎ

Mîr Celadet BERDIRXAN
& Roger LESCOT

KETINA FONEMAN Û SIVIKBÛYÎN*

Yek ji xasiyetên zimanê kurdî ew e ku timî sivikbûyîn û weciziyê digere. Ev meyl li nemaze di hevoksaziya (sentaksa)1 vî zimanî de tê dîtin. Emê di paragrafên jêrîn de bibînin ew çawa xwe di qanûnên fonetîkê2 de nîşan dide. Her gotinekî kurdî, bi veguherîneke xwezayî (tabiî), hingî diçe kurtir dibe, hin bi hin hejmareke ta mimkin mezin a dengên xwe davêje, ta ku bibe yekîteyî (yekheceyî). Ev veguherîn geh bi avêtina hin elemanan, geh bi vekişînê3 dibe. Emê yek bi yek li van her du awayan binêrin.

KETINA DENGDÊRAN

Em dizanin ku dengdêrên e û î, gava ku nêzî dengdêrên dirêj bin pirîcar dikevin. Va ne hin mînakên (mîsalên) din ên ketina dengdêrên kurt û dirêj:

Rizyang, giyayek, ji bo *rizyanik*.
Dargering, giyayek ku xwe li daran dipêçe, ji bo *dargerînek*.
Argûşk, keviyê paşîn ê çena jêrîn, ji bo *alîgûsk*.
Parxan, ji bo *parûxan*.

KETINA DENGDARAN

Pirîcar çend dengdar bi hev re dikevin ji bo ku gotin siviktir bibe:

a) Di nava gotinan de.

Mînak: *Desgeh*, ji bo *destgeh*.
Domam, ji bo *dotmam*.
Desmal, ji bo *destmal*.
Cênik, ji bo *cêndik*.
Biçeng, ji bo *binçeng*.
Cihar, ji bo *cehwar*.

b) Di dawiya gotinan de. Gelemparane ji her du dengdarên dawî ya diduyan winda dibe.

Mînak: *Yekşem*, ji bo *yekşemb*.
Por, ji bo *port*.
Ben, ji bo *bend*.
Berçav, ji bo *berçavik*.
Erzîn, ji bo *erzînik*.
Gir, ji bo *girs*.

Lê çend mînakên ketina dengdara pêşî, ya ji her du yên dawiya gotinê, jî te dîtin:

Mînak: *Zengelok*, ji bo *zengelork*.
Pêpik, derece, ji bo *pêping*. (ji pêpeling).

KETINA KOMÊN FONEMAN. Di gelek gotinan de, dengdêr an dengdarên bi serê xwe na lê çend fonem bi hev re winda dibin. Guhêrandinên wilo gelemperane dogitinên ku sê an bêtir kîteyên (heceyên) wan hene de xwe nîşan didin û dixwazin ew bikin du - an sê kîteyî.

Mînak: Di dawîya radera (infinitiva) lêkeran (fiîlan) de - *ayîn dibe - an*.

\- *iban*
Nêrîn, ji *nihêrîn*.
Gurçik, ji gurçîlik.
Ar, ji *agir*.
Tevnepîrk,
tora pîrhevokê, ji *tevna pîrikê*.
Zêrker, ji *zêringer*.
Parsû, ji *peransû*.
Mestir, ji *mezintir*.

Vekişîn. Emê fonemên vekişînê di du koman de ji hev veqetînin:

a) ên ku berhemên rasthatinên tesadufî (daçek û pronav, pêşlêker û lêker, hwd.) ne.

b) ên ku bi awayekî timî di nav gotinan de xwe nîşan didin. Encama wan hemûyan ew e ku hin komên sabît ên ji dengdêran (gelemperane yên kurt) û ji dengdaran pêkhatî winda dibin, cihê xwe ji dengdêrên dirêj ên yekta re dihêlin.

Di tabloyên jêrîn de me teşeyên (formên) ku di hin devokên çiyayî yên bi awayekî giştî kevnaperêztir (Botan, Hekarî, Behdînan û heta Tor Abdîn) de mane û peyvên devokên deştê dane ber hev. Hejmar û lihevkirina van mînakan wisa ne mirov dike teoriyek çêke û bêje ku ev veguherîn di pêşveçûna sîstema dengî ya kurdî de qûnaxek nîşan didin.

Nivîsarên klasîk ên kevn ên li ber dest kêm in û kêm faîde ne ji bo teyîda vê teoriyê: em hê li hêviya çapên wan ên zanistî ne û ji xwe di wan de gelek peyvên erebî û farisî hene.

a, yek di şûna komên *-eh-*, *-we-*, *-ehe-*, *-ehi-* de xwe nîşan dide.

Mînak: *Kanî*, ji *kehnî*.
Patin, ji *pehtin*.

Danû, ji *dehnû.*
Daşik, ji *dehşik.*
Canî, ji *cehnî.*
Ra, ji *reh.*
Bajo, ji *behjo.* (fermana *ajotin*).
Bavêje, ji *behvêje.* (fermana *avêtin*).
Bawer, ji *behwer* (bawer kirin).
Şar, ji *şehir.*
Panî, ji *pehnî.*
Paîz, ji *pehîz.*
Fam, ji *fehim.*
Xastin, ji *xwestin.*
Xwar, ji *xweher.*
Par, ji *behir.*
Tal, ji *tehil.*
Çav, ji *çehiv.*
Pan, ji *pehin.*

ê, yek şûna komên *-eh-*, *ehi-*, *-ey-* digre.
Mînak: *Rê,* ji *reh.*
Bêvil, ji *behvil.*
Şê, ji *şeh.*
Rêl, ji *rehil.*
Avêtin, ji *avehtin.*
Mêvan, ji *mehvan.*
Bêtir, ji *behtir.*
Rêtin, ji *rehtin.*
Çêlek, ji *çehlek.*
Pê, ji *pey.*
Kêf, ji *keyf.*
Elêh, ji *eleyh.*
Hêv, ji *heyiv.*
Mêw, ji *meyiw* an *mehiw.*

î, yek şûna komên *-ih-*, *ihi-* û *-iyi-* digre.
Mînak: *Tirî* ji *tirih.*
Bî, ji *bih.*
Cî, ji *cih.*
Pêçî, ji *pêçih.*
Sipî, ji *sipih.* (heywanek wekî *kêçê*)
Sîwan, ji *sihwan.*
Sî, ji *sih.*
Dîtin, ji *dihtin.*
Bibîne, ji *bibihne.*
Rîtin, ji *rihtin.*
Mî, ji *mih.*
Tî, ji *tihin.*
Mîvan, ji *mihvan.*
Gilî, ji *gilih.*
Bîn, ji *bihin.*
Dîn, ji *dihin.*
Hîv, ji *hiyiv.*

Koma *-hi-*, di destpêka gotinan de gelek car dibe *î.*

ŞANEK I. Dixuye ku koma *-eh-* geh dibe *a* geh *ê.*
ŞANEK II. Teşeyên paralel, destpêkî (îptidaî) an vekişî, ku di tabloyên jorîn de tên dîtin, wekî mehvan û mihvan, ku dibin mêvan û mîvan; heyiv û hiyiv, ku dibin hêv û hîv, tên îzah kirin ji ber ku e û i bi hêsanî şûna hev digrin an cih diguhêrin.

Mirov dikare bibîne ku buyerên vekişîna peyvên biyanî yên ku ketine nav kurmancî eynî wekî yên gotinên bi eslê xwe îranî ne. Wekî di gotinên fehm de. keyf, eleyh. Mînakên wila di lîsteyên jêrîn de jî tên dîtin.

o, yek dikeve şûna komên *-uh-*, *-we-*-, *-wî-*, *-wi-*, *-ihu*, *-weyi-*.
Mînak: *Gotin,* ji *guhtin.*
Ronî, ji *rihnî.*
Ronahî, ji *rihnahî.*
Cot, ji *ciht.*
Sotin, ji *sihtin.*
Ordek, ji *werdek.*
Go, ji *guh.*
Sond, ji *swind.*
Kor, ji *kwîr.*
Goz, ji *gwîz.*
Stiro, ji *stirih.*
Ajotin, ji *ajihtin.*
Movik, ji *mihvik.*
Motac, ji *mihtac.*
Don, ji *dihun.*
Bost, ji *bihust.*
Borîn, ji *bihurîn.*
Xong, ji *xweying.*

û, yek ji komên *-wî-* û pirr kêm car, ji *-ih-* tê.
Mînak: *Dûr,* ji *dwîr.*
Kûr, ji *kwîr.*
Qûz, ji *qwîz.*
Xûn, ji *xwîn.*
Xûşk, ji *xwîşk.*
Hûr, ji *hwîr.*
Stûr, ji *stwîr.*
Tûj, ji *twîj.*
Şûr, ji *şwîr.*
Şûjin, ji *şihjin.*

ŞANEK I. Koma *-ih-* dikare him *o* him *î* bide wisa jî, *-wî-*, ku piranî dibe *û*, carna *o* dide.
ŞANEK II. Peyvên tabloyên jorîn bi piranî ji rehên îraniya kevn tên û di wan de konmên deg-dêr û dengdar hebûn, û me di mînakên jorîn de vekişîna dûr, dîtin, kanî, hwd. tenê dengdêrên dirêj hebûn.

* Ev bend ji pirtûka *Grammaire Kurde*, Emir Djeladet Bedir Khan & Roger Lescot, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris, 1970, hatiye wergerandin.
1.hevoksazî (sentaks): rêza gotinan di hevokê (cumlê) de; awa û rastekên (qaîdên) çêkirina hevokan.
2. fonetîk: beşê zimannasiyê ku bi pirsên foneman (her yek ji dengên ziman) mijûl dibe. Fonemên kurmancî di alfabeya kurdî ya latînî de bi 31 tîpan (herfan) tên nivîsîn. 8 ji wan dengêr in: *a, e, ê, î, o, u, û.* 23 ên mayî dengdar in.
3.vikişîn bi mana contraction, çûn ser hev, kurt bûn, kişan ser hev hatiye bi kar anîn.

JI NAMEYÊN XWENDEVANAN

Xwendevanekî *Kurmancî* ji navçeya Midyadê, navên hin gîyayan şandine.

karî: Giya ye, reng kesk, bejn 30 cm, sapê wê pan e, nîvgera wê 2 cm ye. Pelên wê wekî yên darê ne, tên hişk kirin û tevî xwarinê dikin, tama goşt dide, bi xavî tama wê tûj e; li çolê tê dîtin (li gor Eleşkîrtî).

tirşok: Giya ye, biharê der diçe, bi xavî tê xwarin, tama wê tirş e. Reng kesk, bejn 50cm, sap gilover û nîvgera wê 2 cm ye (li gor Midyadê û Eleşkîrtî).

gûriz: Giya ye, biharê derdiçe, ji bo xwarinê tê kelandin (wekî espanax), hêk û rûn tevî dikin, bi xavî tama wê şor e, reng kesk, gava şîn e kulîlkên wê pembe ne (bejn: 1cm), gava mezin dibe bejn 1 m ye (li gor Midyadê).

qahfûr: Ji sapa gûrizê tê çêkirin, wekî teneka çopê tê bi kar anîn (li gor Midyadê).

nûsek: Li ber avê çêdibe, wekî pelewêsk e, wekî espanax tê xwarin (li gor Elîşkîrtî).

pelewêsk: Li ber avê çê dibe, bejn 10cm., sapa wê tê avêtin û ji pelên wê dolme tê çêkirin (li gor Mîdyadî û Eleşkîrtî).

gûlik: Mehên nîsan û gulanê derdiçe, bej, 5cm., wekî tiliyeke qalin e, reng kesk, bi kêra tê çinîn, tê kelandin, hêk û rûn tevî dibe (bi tirkî çiliş).

reşik: Li ser avê derdiçe, zirav wekî sapan trî ye, tê kelandin û rengê reş dide, ji bo rengdana rîsê tê bi kar anîn (nayê xwarin).

mendik: Biharê derdiçe, bejn 30-40cm., wekî cigareyek qalin e, qaçilê ser radikin û bi xwavî tê xwarin, tam û rengê kelenka dide.

cax: 2 tilî pan e, bejn 20-25 cm, serê wê şax dide û tê de çeva hûr wekî pincar heye (ew tê avêtin), tama wê tûj e, tê kelandin û xwarin, ji ber tirşî jî çêdikin.

Ribês: Derbiharê dertê, di ciyê qumlaxê de mezin dibe, koka wê li ser erdê de pel dide, sapa wê 40 cm. radibe, qaçilê sapê radikin û sapa wê bi xavî tê xwarin (tirkî ışkın).

Hevalên hêja,

Hejmara kovara we ya *Kurmancî* ya duda kete destê min. Mala we ava. Ew rojnama delal dikare kêrî her mirovekî zane jî bê.

Ez jî dixwazim hine bîr û bawerî û serdazêdekirinêd xwe bêjim, belkî we gerek bin. Em ji renga dest pê bikin: Navê renga li bal me ev in:
Sipî: çîl, qerqaş, sîs, boz (hespê boz), kever, çal

Reş: qer, hemis (seyê hemis), qemer, esmer (reşê vekirî)
Sor: al, gevez, kumeyt, xanimreng
Şîn: hêşîn, kesk
Sût : şîrkî, şînboz
Zer: qîçik, şê, çûr, kej, çeqel, soron, narincî.
(Çend rengêd din): belek, gewr, qawereng

Têmûrê XELÎL
Rewan-Ermenistana Sovyetî

Bêjeyên ku cihan nîşan didin

Amadekar : Mûsa KAVAL

1- Navên ku cihekî bi awayekî giştî nîşan didin:

Weke: cih, cî, cîh (li hinek navçan "*cî*", "*cik*" jî dibêjin).

- der	- şûn
- erd	- dews
- avahî	- teng
- xanî	- rêç
- mal	
- war	
- şop	

2- Navên cihan ku bi arîkariya paşpirtikên istan, xane, geh, dank û ok ê tên çêkirin;

A) ISTAN
Bi arîkariya istanê navên hinek cihan çêdibin ku li wan cihan bê hijmar ruhber û tişt hene.
Ev cih ji bo wan wek war an welat e.

Weke:
Kurd + istan —> Kurdistan
Afxan + istan —> Afxanistan
mor + istan —> moristan
mar + istan —> maristan
gul + istan —> gulistan
dar + istan —> daristan
şehir + istan —> şehiristan
dib + istan —> dibistan

B**) XANE**
Bi arîkariya xaneyê navên cihan çêdibin ku dorgirtî û sergirtî ne.

Weke:
derman + xane —> dermanxane
mêvan + xane —> mêvanxane
nexweş + xane —> nexweşxane
mey + xane —> meyxane
girtî + xane —> girtîxane
çay + xane —> çayxane
pirtûk + xane —> pirtûkxane

C) GEH
Bi arîkariya gehê jî navên cihan çêdibin.
Weke:
havîn + geh —> havîngeh
seyran + geh —> seyrangeh
kêlan + geh —> kêlangeh
dirûn + geh —> dirûngeh
şer + geh —> şergeh
zanîn + geh —> zanîngeh

D) DANK
Bi arîkariya dankê navên wan aletên ku cih in tên çêkirin.
Binyatê dankê dan e û k li ser hatiye zêde kirin ji ber ku ew û rader (mesder)ên lêkerên hevedudanî ji hev bên cihê kirin (weke: avdan, xwêdan)

Weke:
xwê + dank —> xwêdank
av + dank —> avdank
kil + dank —> kildank
dew + dank —> dewdank
xwelî + dank —> xwelîdank

Ok
Bi arîkariya paşpirtika okê jî navên cihan çêdibin.
Weke:
serşo + k —> serşok
cilşo + k —> cilşok
(Gava rehê gotinê bi o yê biqede oya okê dikeve, k dimîne.)

3-

hir	vir	ku cihên nêzîk nîşan didin
hê re	vira	
hê ve	vê rê	
	vê dê	
	vê derê	

wir	wê de	ku cihên dûr nîşan didin.
wira	wê dê	
wê rê	wê derê	
	wê ve	

4- Bêjeyên ku alîyekî ji aliyan nîşan didin.

alî	nikar	ba
rex	la	
kêlek	kenar	
mil	cem	dev
tenişt	nik	
teng		

5- Bêjeyên ku hemû aliyan nîşan didin:

dor	hawîr
dormandor	hawîrdor
rexanrex	dorhêl
çarnikar	dorûber
çarrex	doralî
rastûçep	derûber
çarkenar	derûdor
	çaralî